

JI BO PÊŞWAZIYA ZIVISTANÊ, **AMÛDÎ** XANIYÊN XWE YÊN AX DISEYINÎNIN



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



ولات: مجله شهرية ثقافية عامة

العدد (٥٥) ٢٠١٨/١٠/١ م

Welat
01/10/2018
Çandî - Giştî - Serbixwe

"KURDO.. BI ZIMANÊ XWE
BIXWÎNE Û BINIVÎSE, YAN JÎ
NEBÊJE EZ KURD IM"

CELADET BEDIRXAN

Welat





"Kurdo.. Bi zimanê xwe bixwîne û binivîse, yan jî nebêje ez kurd im"
Celadet Bedirxan

Desteya sernivîs

2 Sed sal bêtir, şerê gelê kurd bi hemû şîwazên qirêj tê kirin, hişmendiya hêzên dagîrker heya îro roj negihîştîya wê astê ku mafê gelê kurd wekî gelekî ku li ser xaka xwe ya dîrokî dijî bipijirîne û nas bike.

Hewldan û pîlanên qirkirin û bişaftina gelê kurd qet ji ejendeya dagîrkerên kurdistanê ranebûye, tevî ku vê hişmendiya şofînzim ziyanêke mezin gihandiye welat û gelên deverê, lê diyar e ku ev desthilatdarî derbarê dijîtiya doza kurdî de hevfiqir in.

Li hemberî vî şerê qirêj, gelê kurd neçar e ku li ber xwe bide, û hebûna xwe biparêze.

Yek ji awayên şerê qirêj şerê çandeyî bû, bi dehê salan çanda kudî ji hêla hêzên dagîrker ve hatibû qedexekirin, di encamê de, piraniya gelê kurd ji çanda xwe hate bi dûr xistin, û çanda gelê serdest ji xwe re kir çanda sereke, her wiha ziman û çanda kurdî li paş ma.

Bêguman dagîrkerên kurdistanê bi zanebûn ev şer meşandin, çiku wan xweş dizanîbû ku hebûna gelê kurd girêdayî hebûna çanda wî ye. Li hemberî vê siyaseta bişaftinê tevgerike li ser asta kata bijarde ya rewşenbîrên kurd derkete holê, di serî de ronakbîrê kurd Celadet Bedirxan bû, yê ku ji mêj ve li zengilê haydariyê da dema got: (kurdo bi zimanê xwe bixwîne û binivîse yan jî nebêje ez kurd im)

Hinek ji rewşenbîr û ronakbîrên kurd li vê metirsiyê haydar bûn û hewldan kirin ku berê gel bidin fêrbûna zimanê dê, lê mixabin, ji ber gelek pirsgerêk û astengiyan

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane



Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, paraştine

Ji bo têkiliyê:
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

nikarîbûn bi ser bikivin, tevî ku roleke baş listin di parastina zimanê kurdî de.

Îro roj em dibînin ku piraniya nivîskar û rewşenbîrên kurd bi zimanê çanda serdest dinivîsin, rêjeya kurdên ku dizanin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin jî pir hindik e, ger em nebêjin ku ew li ser tîlîyên destan tene hejmartin.

Îroj ji her kurdekî tê xwestin ku guhdanê bi zimanê xwe bike, wî bide pêş û pê binivîse û bixwîne, nemaze ku derfet hatiye û di nav dest de ye, kurdên ku zimanê xwe piştguh dikin û zimanê çanda serdest di ser re digirin, ew kurd ber bi bişaftina netewî ve diçin.

Pêdiviya me kurdan bi şoreşê çandeyî heye, bingeha vê şoreşê vegera li zimanê dayikê ye, û derketina ji bin eba çanda serdest e, divê hemû rewşenbîr, sazîyên ziman, çandê û perwerdeyê yên li hindir û derveyî welêt û ragihandina kurdî -bi taybet ya nivîskî- bi barê vê şoreşê rabin. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution



حياتي التي في قفّة

عماد الدين موسى

٥- تميل الأغصان لرغبة دفينّة/ نجهلها

الساقية أنشودة/ حين المياه إلى نبعها الأول.

٦- بنظرة واحدة اختصر الغابة/ وربما الطبيعة أيضاً،

نظرتي نورس/ بجناحيه يضم البحر

والأسماء/ والمياه

والشاطئ/ والعشاق

وذكرياتهم الدفينّة بين الصخور..

نظرتي البحر.

٧- المرأة كذلك/ نبع.

٣- ثمة أرض/ غمرتها المياه الآسنّة

بينما البيوت/ - في الأسفل- غدت كمصحات أبدية لترويض الملل.

٢- السفينة إن غرقت/ تناثرت الأرواح كعصافير بداية الربيع بشفاها الملوّنة..

الأرواح التي/ - بأجنحتها التسعة- عصيّة على المياه.

٤- الينابيع سيرة أخرى/ ينبغي أن ننشدها

الينابيع بموسيقاها العامرة/ كفر زائل.

١- لم تعد لديّ أشياء حميمة/ لم يعد يعنيني شيء..

حياتي التي في قفّة/ - كقطّ مدلل- أتركها على الحافّة لربّما يتلفها أيّ عابر.

٢- باكراً في الصباح/ - كمن فقد شيئاً ونسيه- أستيقظ..

مثلما عاشق/ يقف على الناصية/ أرقب، بلهفة، الغيمة السائرة كقارب

وكصياد عجوز/ فقد عادته/ أندرب على قصص الألم أو الأمل لا فرق.. لا فرق..

الحياة عود كبريت/ يتّهيّ للاشتعال.



BIHNEK JI SIRÛŞA PEYAMA TE

Hozanê Girkundê

Welatekî sitembar,
kirasê bindestiyê
li xwe zîvar zîvar
kir û ber bi asoyekî
winda, hêdî hêdî
hilkişîya, belkî dikaribe
li wê derê, bihnek
ji azadîyê, li ser
rûpelên dîroka
mirovahîyê, wajo bike
û biafirîne...
Welatek ji demek dirêj,
govenda bûyeran
saz dike,
li pênas û navê xwe
digere,
di nêv mija nîgaşên
xewna de,
dibe mîna rewrewka
leylanê,
li pê dûmana hêvîyan
tîdar dimîne,
Welatekî xwedî

ziman û tor,
qad û dîrok,
hînê wisa ji sawa
çewsandinê
ditirsêêêê.
ku razên veşirtî
ji bin tevna salên pîr
derîne.
Ev peyama hebûnê
hînê çavên xwe
li xwenedarekî evîndar
digerîneee... ■



SÎNEMA KURDÎ, BERXWEDANA NERMÎN

Izedîn Salih

Huner neynika civakan e, sînema jî yek ji hunerên nûjen e, ku dîrok, şaristanî û taybetmendiyên gelan tomar û belge dike, ji nifşekî bo yekî din vediguhêze. Ji dayik bûna sînamayê vedigere dawîya sedsala 19an, dema ku herdu bira (Ocêst û Lwîs) Lomyêr makîneyek şanîdana wêneyên livgir dahênan kirin, bi rêya wê, di 3ê Sibata 1895an de, herdu filmên xwe "Derketina Tirênê ji Kargehê" û "Gihîna Tirênê bo venîştîgehê" li Ferensayê pêşkêş kirin.

Qonaxên pêşketina sînemayê:

Li gor rexnevan û dîroknasê sînemegir Filîp Konglîton, pêşketina sînemayê di çar qonaxan re derbasbûye:

1. Serdema seretayî: karzanîneke nû bû, ku tede filmê kamîreya yekem hate kişandin, ew film bédeng bûn, bêhtirê wan belgefilm, nûçe, û şanoyên tomarkirî bûn.
2. Serdema filmên bédeng: di vê qonaxê de şanoyên tomarkirî ji holê rabûn, û li şûna wan çîrokbêjî hate bikaranîn.
3. Serdema berî cenga cîhanê a duyem: tede deng derbasî nava sînemayê bû, û yekem filmê axêver di sala 1927an de bi navnîşana "dengbêjê Jazê" hate çekirin.
4. Serdema zêrîn: ji piştî cenga cîhanê a duyem, sînema nûjen bû, û awayê çekirina wê jî pêşket, di pey re filmên cûrecûr belavbûn.

Girîngiya sînemayê bo Kurdistan:

Têkiliyeke xurt di navbera wêje û sînamayê de heye, derhênerên mezin jî nameyên xwe (sînaryo) li ser berhemên wêjeyî ava dikin, wekî mînak ku romanên klasîk yê naskirî bo filman sînaryoyên amadekirî ne, çiku sînaryo li ser bingeha çîrokekê ava dibe, anku kesayetî, gotin û dîmen tev di tevna çîrokê de ne, û bi van hêmanan derhêner dixwaze ku nameyekê bighîne temaşevanan, lê ne bi awayekî vekirî, bi awayekî sergirtî. Ji lewra pêdivêtiya ku Kurd bo geşkirina çanda sînemayê û çekirina filman bixebitin, û her çiqas ku dewleteke Kurdî li herçar perçeyên Kurdistanê tune be jî, divê ku zana û rewşenbîrên kurd di hemû tevgerên xwe de bo avakirina bingehe û dewletê bilivin, û di barê vê de sînemayê bi kar bînin, çiku di roja me ya îroyîn de dewletên serdest û bihêz sînemayê wekî çekekê bi kar tînin, û sînema her çiqas alaveke hunerê be, alaveke propagandayê ye jî, ku dewletên navbuhurî û ser serê wan Emerîka, bi saya filman hem têkçûyînen xwe vedişêrin, û hem jî çand û jiyana xwe li cîhanê belav dikin, vêca divê ku Kurd vê yekê ji dest bernedin,

nemaze ku li serdirêjahiya xaknîgariya kurdistanê gelek mijar hene ku hîn li ser wan xebatên filman nehatine kirin, anku çîrokinê xwerû "sînaryo" hene, ku hîn derneketine ser rûwê zemînê.

Astengiyên ku di rêya sînema kurdî de ne:

Sînema Kurdî ji ber perçebûna welatê Kurdistan di navbera çar dewletên serdest de, sînemayeke derengmayî, û pirzimanî ye. Em dikarin bibêjin ku sînema Kurdî hîn di asta destpêkî de ye, herwiha sînemegerên Kurd bêhtir ji filman, xebatên kurtefilman dikin, zêdebarî ku li piraniya herêmên Kurdistanê hêmanên berhemên sînemayeke cîhanî peyda nabin, çiku jêrxaniya bingehe jihevketî ye, ne stûdyo, û ne jî holên sînemayê yê xwedî karzanînen nûjen hene, herwiha kesên ku di warê sînemayê de kardîkin pêdivêtiya piştevanîyê ne ta ku karibin dîroka gelê Kurd ji nû ve binivîsin û bi zimanê sînemayê yê cîhanî belav bikin, lê ev yek jî ne li ber dest e.

Sînemegerên Kurd:

Gelek sînemegerên Kurd gihiştin asteke pêşketî di sînemayê de, ji ber ku wan naskir ku kamîra wênegirê rasteqîne yê çav e, û çav jî wênegirê rasteqîne yê sînemegerê zana ye ku ew nerîn û têgihiştina wan ji huner û jiyanê re derdiberîne, û wan karîne ku filmine girîng çêbikin, û bi rêya wan tevî festîvalên xweçêhî, erebî û cîhanî bibin, herwiha xelatine nirxûha jî bi dest bixin, ji bilî veguestina kêşe, sirûşt, şaristanî, çand, rêwrêbazên gelê Kurd û xembariyên wî li tevahiya deverên cîhanê, û ji xwe girîngiya sînemayê û metirsîbûna wê ji vê yekê tê, û ji sînemegerên Kurd ên navdar, ji bakurê Kurdistanê sînemegerê bi nav û deng Yılmaz Güne, ji başûrê Kurdistanê Hunermend Selîm, ji rojhilatê Kurdistanê Behmen Qobadî, ji rojavayê Kurdistanê Ekrem Heydo ye.

Wekî tê zanîn, di dehsalên çûyî de, derhênerên kurd li xaknîgariya kurdistanê, û bi zimanê kurdî û bi lîstikvanên kurd filman dikşînin, û her çiqas ev film li ser navên dewletên dagîrker ji xaka Kurdistanê re bîr pejirandin jî, ev film, filmên Kurdî ne, û wekî sînema kurdî tên derbirîn. Ev jî li hember têkçûyînen Kurdistanê berxwedaneke nermîn e, di ber hebûna kurd û sînema kurdî de. ■

Jêder:

1. Sînema û Nasnameya Kurdistan, gotara Dilzad Art, rûpela komeleya Nûbiharê, 2016an.
2. Nerînek di ware sînema Kurdî de, gotara Kazim Murşid Selûm, 2013an.
3. Zerya Wikipedia ya Eliktronîk.



CIL Û BERGÊN JINA KURD

Salihê Heydo

Çawa tê zanîn, ji bilî rabûn û rûniştin, xeyset, xî, ziman, durv û reng di zanav, nasname û jihevaskirina milletan de tiştekî sereke û bingehîn heye ku di rewş û rêdana berçavkirin û nîşandana gelan ya netewî de roleke girîng û kêrkirî di derûn û giyanê wî de dilîze, belê ev nîşana diyar û darîçav cil û berg in.

Ez dixwazim tenê di vê gotara xwe de hineke ruhnî bavêjim ser cil û bergên jina kurd, nemaze yên ku ji pêma û folklorê me yê pîroz û giranbûha tene vekêşan û tevgerêdan, û pêwendiyên wî bi dîroka kurdî ya Kevin û dîr û dirêj di gel regezên surîşt û xwezaya kurdistanê re vewejêrim û bidim şirovekirin enegorî dîtina xwe.

Bêguman, çi millet, an hûrgel, gurûp û komizên nijadî û neteweyên ku li ser goga zemînê û cîhana gêtî de hatine afirandinê û dijîn, talî û şêraniya jiyanê bi her tewrên wê dîtine, çi di sînorê xaknîgariya xwe de, çi di avakirin û damezirandina mezintirîn şaneşîn û impiratoriyên şaristanî de bi cil û bergên cuda û têvil hatine dîtine. Belê, em dikarin bibêjin ku ew cudabûn ne xweber hatiye nitirandin, afirandin û kîvîşê, lêbelê li gorî surîşt û xwezaya wî welatî û xelkên wî ne, an li gorî kar û barê wî gelfî ku bi çi awayî dane û standine bi hêsanî û diwariya xwe ve, bi regez û afrîdeyên wê re, ji bo berçavkirina jiyan û pêvajoyê û rêveçûna xwe di cîhan û gerdûnê de bîne qanê.

Gelê me, gelê kurd bi xwe ji kevintirîn gelên ku li vê herêmê (bi taybetî Kurdistan û herêma rojhilata navîn) cihê xwe di kûraya sing û berên rûpelên dîrokê de bi dewlemendî girtiye, û di biwara rêveçûn û pêvajoya xwe de xwedî çalaktirîn derbasok û şaristanî ye, çawa ku belge û dakomentên mûzîxanan ve şaristanî û şarezatîyê bi her cûreyên xwe ve eşkere û diyar dike, her wisa jî xwediyê impiratoriyên kîvîş, fireh û berbiçav e weke : (Zobar, Gotî, Horî, Mîtanî û Mîdya).

Weke ku em tevde dizanin Horî û Mîtanîyên kurd dewlet û şaristanîyên xwe li jêrî çiyayê Toros damezirandibûn, ku niha çiyayê (Omeriyan, Qerejdax, Tora banî, Tora jêr, û Bagok) jê re tê gotin, ku vedigere nîveka paşî ji sêhezarsaliya berî zayînê, piştî ku ji welatê xwe yê makderî ji hindam û devera Wanê hatibûn û paytexta

wan Waşokanê bû ku heya niha xomar û şûnwarên wê li derdorê Serê Kaniya îroyî ne, bi taybetî di fêza çavkaniyên çemê Xabûr de ne.

Mebest û kama sereke ji vê raxistinê ewe ku ez karibim bi xurtî cil û bergên jina kurd li vê herêmê weke li (Dirbêsiyê, Serêkaniyê, Amûdê, Qamişlo û Tirbesipiyê) bi hemî gund,

êl û eşîrên wê ve-çi serxet û çi bînxet-û dapoşîna van cil û bergên taybet bi dewleta Mîtanîyan ve girêbidim.

Berî her tiştî, cil û bergên vê devera ku min li jor nîşanda tev yek terz in, ji vî terzî li devera Şingal û Wanê jî tene dîtin, nexasim ew jinên ku li deşt û bestan dijîn.

Ez dixwazim bînim ziman ku ev cil û berg û terz Mîtanî ne, ji ber ku heya niha pîrejinên kurd dibêjin keça xwe, yan xuşk û jinên cîranên xwe :

(Keçko, mîtanê xwe li xwe ke)

Yan jî, di helkeftin, cejin û govendan de dibêjin :

(Xemil û xêza mîtanî xwe lê dixwar)

Berê, çaxê ku mûsim û debarê xwe hiltanîn, û dema kinckirrînê dihat, mezina malê diçû bajêr, cil û berg ji malî, dot û kuflet re dikirî û soz dida keça xwe ya nazik û delalî ku mîtanîyekî jê re bîne.

Ji bilî van gotinan, gelek dengbêjên kurd di stranên



Kobanî



Serêkaniyê



Derbêsiyê

Derbarê heman mijarê de, ciwanek bi navê Silêman dibêje:

“Seyandina xaniyan salê carekê tê kirin, ew jî wextek wê heye, her sal di vê mehê de, ji ber ku welatî pişrûka xwe li wan kom dikin hin kolanên Amûdê tene girtin, di vê demê de jî her roja îne xort li malekê cîranê xwe heriyê dikin û alîkariya wê malê dikin, dema ku ez diçim alîkariya cîranekî xwe ji bo seyeka xaniyê wî, divê ew jî bê alîkariya min roja ku ez xaniyê xwe bisey-inînim.

Em bi kêf û henek wê rojê derbas dikin û seyeka xanî xelas dikin, û di xelasokê de em bi hev re li sifriya xwarinê kom dibin.”

Hêjayî gotinê ye ku di salên dawî de tevgera avakirina nûjen ya bi hesin û çemento li Amûdê çalak bûye, lê hîn avakirina xaniyên ax li Amûdê peyda dibe û gelek xelik van xaniyan ji yên çemento xweştir dibînin. ■



JI BO PÊŞWAZIYA ZIVISTANÊ, AMÛDÎ XANIYÊN XWE YÊN AX DISEYINÎNIN



Efsan Kurdî

Xelkên Amûdê, Hemû pêdiviyên avakirina xaniyên xwe yên ji axê bi xwe amade dikin û bi dest dixînin wek (danheva poş, çêkirina kelpîçan), karê avakirina xaniyan jî bi rengekî hevkarî tê kirin, xwediyê xanî bi alîkariya cîran, dost û hevalên xwe xaniyê xwe ava dike. gelek kes beşdarî kar dibin heta ku avakirina xanî tamam dibe.

Tevî ku xaniyên axê mirov ji rewşa kêş û seqayê diparêze, ji hundir ve zivistan-an gerim in, havînan hênîk in, Lê salane pêdiviya wan bi çaksazî û seyekê ve heye. Çiku baranên zivistanê bandora xwe li wan dikin, û eger her sal ser baniyê wan neyê seyandin ewê di barîna baranê de dilopan bikin.

Ji ber vê yekê di destpêka meha Îlonê de, xwediyên van xaniyan dest bi seyandin û sazkirina xaniyên xwe dikin, dêmek di vê demê de rewşa seqayê xweş dibe, herweha demsala zivistanî nêzîk dibe.

Derbarê karê çaksaziya xaniyên ax de, Welatîyê bi navê xoşnav Ehmed ji kovara Welat re got:

“Her sal ez xaniyê xwe diseyinînim ji bo ku dilopan neke, destpêkê em bi ax û kayê pişrokê çêdikin, qederê hefteyekê em wê pişrûkê dihêlin da ku baş tirş bibe, Paşre em pişrûka xwe nerim dikin, yan şeva seyekê yan jî roja wê em xuya kevir tevî wê dikin û pişt re wê heriyê distirên, û em bi werîsan an çirkê dikşînin ser piştî xênî û diseyinînin.”

Derbarê zehmetiyên karê çaksaziya xaniyên ax de, Xoşnav got :

“Berê xort pir bûn, bi hevkarîya wan kar bi hêsanî dimeşiya, her xortek karek dida ser milê xwe, te didît yek li ser kişandina werîs bû, yekî din sêtil dadigirt yekî din karê seyandinê fikir ew jî wek hoste tê naskirin, lê mixabin anha xort kêmbûne, her yek bi cihekî de çûye, ên ku mane jî, her yek bi karê xwe bilyaye û nema kes ji kesî re vala ye, ji lew re em neçar in karkeran kirê bikin da ku bi karê çaksazkirina xaniyên me ve rabin.”

xwe de-nexasim yê li ser dilan- çêla Mîtan dikin. Em binerîn li Kerebêtê Xaço, çaxê lawikê metînî dibêje bi vê hevokê diqîre :

Kanîkê me şêxan û mîran çendî bi rêz in

Keçikê me xwe girêdane bi mîtanê firêz in

Xeberê bidin lawikê metînî, heger tê min dixwaze bera bê min bixwaze



Amûdê



Qamişlo



devera Aliyan

Heger min naxwaze wê sibehê min biguhêzin.

Gotina (Mîtan) û şûnde (lawikê metînî) gelo çima di yek firdika stranê de hatine gotin?

Metîna bi xwe jî navê çiyakî ye, û navê gundekî û eşerekê ye jî li zinara çiyayê Torosê ku me ew li jor nîşanda, û ev nav, Dêrika Çiyayê Mazî (Şebextanê) bi xwe ve girê dide. Her wisa, gundek bi navê Metîna li devera Omeriyan heye, ev gund dikeve eynî wî çiyayê gotî ku mîtaniyan li rajêrî wî şaristaniya xwe li dar xistibûn.

Helbet kurd ji xeftan re dibêjin (Mîtanê kobekirî), her wisa ji qutikê çox re jî dibêjin (Mîtanê surmekirî). Hêjayî gotinê ye ku sîmbol û şana dewleta Mîtaniyan nîgarê kevokê bû.

Ji bo ku em karibin hîn xurtir cil û bergên jina kurd bi Mîtaniyan ve girêbidin, divê em hemerî û pêwendiyekê di navbera cilên wê û per û postê kevokê de çêkin, û engorî hev nîşan û raçav bikin. Ku mirovek bi hûrbînî li xeftanê jina kurd binêre û xweşik ji paşve lê sêre bike, bêguman dûv û terriya kevokê tê

de dibîne. Qutikê çoxê surmekirî ku mîtan jê re tê gotin, piştî kevokê nîşan dide. Hûçikên kirasê wê, nemaze çaxê ku destê xwe wek bask dirêj dike û tîne semta millên xwe, ji paş ve, baskên kevokê nîşan dide. Şêl, derling yan serkab, per û pûta lingê kevokê tîne kifşê, nemaze ku lastîka teng li derbaseka ling di texma gwizekê de şellandî be. Girêdana qezê bi şûtika rengîn, heyasê zîvîn an sohiya bi gulik û gulabenda destçêkirî ku li newqê girêdayî be jêr û jor, ew sîng û ber û pêşîrên hildayî ji pêşî û kêlekê ve, sînga kevokê ya bedew û spehî raçav dike. Girêdana temezî û doraniya rengîn, nexasim bi ser hibriya Mûsilî de gava ku fitil û girênîvkê di ser fitla dî re digêrîne û li pêşaniya xwe girêka tamam çêdike, kubar dinêre û serê xwe pêre hildide, nikilê kevokê tê berçavkirin.

Piştî vê kurtenerîn û ravekirinê li kunc û bergên jina kurd û pîvana wê bi per û postê kevokê re, em dikarin bi senayî ve yekê bi mîtaniyan ve girêbidin, nexasim çaxê em zanibin ku kevok ji keştî û keleka Nûh pêxember firiyaye û çûye devera pîroz û aştiyê nîşankirîye, ew devera pîroz û rengîn, xweş û tenahî, cîgehê evîn û aştiyê, çiyayên Kurdistanê bûn.

Ez kevok im lê lê

Kevoka şîn im way way

Li ser bana, bin bana

ez datînim way way

Per û postê lê lê

xwe d'xemlînim way way

Ez aşiqê lê lê

kurkê dîn im way way ■

Têbînî : wêneyên bi gotarê re, bi destê Salihê Heydo hatine girtin.

REWSEN BEDIRXAN

"Yekîtiya kurdan bide min, ezê kurdistanêke serbixwe bidim te"

Rewsen Bedirxan

Pîştî ku sultan Ebdilhemîd ji desthilatdariyê ket, û sultan Reşad li ser textê desthilatdariya dewleta osmanî rûnişt, rewşa giştî ya maf û azadiyê hinekî baş bû, fermana lêborîna giştî derheqê girtiyên zindanan derket.

Wê hingê Salih Mehmûd Bedirxan deh sal ji hukûmê xwe yê hetahetanî di hundirê zindanê de bûrandibû, û ji ber ku lêborîna giştî lê diket ew ji zindanê serbest hate berdan û ji bo bajarê Oeyserivê hate sergonkirin.

Di 11ê meha tîrmehê sala 1909an de, sultan Reşad li ser textê desthilatdariyê hate rûniştandin, di heman rojê de keçek ji Salih Bedirxan re cêbû, navê wê kir Rewsen.

Piştî 2 salan, malbata Rewşen koçî Stembolê bûn, ku hejmarek mezin ji malbatên Bedixaniyan sergonî wir bûbûn, lê rûniştina malbata Rewşen li Stembolê dirêj nekir, berê xwe da Şamê, û li wir cîbicîbû.

Salih Bedirxan demekê li Şamê bêkar ma, di wê hingê de şerê cihanî yê yekem li dar ket, pêre rewşa jiyana mirovan li tevahiya cihanê aloz û dijwar bû, lewre Salih neçarbû ku di bin nîrîne pir zehmet de li zindana keleha Şamê kar bike. Ji ber zehmetiya wî karî, ew bi nexweşiya tîfroyê ket, di encamê de jiyana xwe ji dest da, wê gavê Rewsen hîn 6 salî bû.

Dêya Rewşen Samya Bedirxan keça xwe şand dibistanê. Piştî ku Rewşen xwendina xwe ya navendî bi dawî kir, xwendina xwe li mala mamosteyan

dewam kir, û bawernamiya mamostatîyê bi dest xist û dest bi karê perwerdekirinê kir.

Di sala 1925an de çû bajarê Kerek yê Urdinê û li wir bû rêvebira dibistanekê.

Di rojnamegeriya Feleştînî de gotar derbarê pîrsa erebî, bûyerên Sûriyê û nûçeyên çalakiyên şoreşgerên Sûrî li dijî Ferensîyan de dinivîsand.

Herwiha gotarên
xwe di kovara
" M u n î r v a "
ya Libnanî û
rojnameya "Mir'at
Alşarq" (Neynika
rojhelat) ya ku



li "Bêtlehma Felestînê" derdiket û rojnameya "Alnidal" (Xebat) a Dîmeşqî ku xwediyê wê "Samî Kubara" bû, ew jî rojnameyeke siyasî serbixwe bû dinivîsand.

Di sala 1928an de vegeriya Şamê û karê mamostatiyê û rêvebiriyê li çend dibistanên wê kir.

Di sala 1934an de bû endama komeleya jinên Sûrî, di salên çelî de li radyoya şamê karkir, bernamêyek perwerdeyî taybet bi zarokan bi navê çîrokên zarokan amade dikir, ku ew bernamê hefteyê carekê dihate weşandin.

Di sala 1944an de nûnertiya jinên Sûrî li kongrê jinan yê cîhanî -ku li Mîsrê li dar ket- kir.

Rewşen Bedirxan jiyana xwe di nav kar û xebatê de derbas kir, helwesta xwe li dijî dagîrkeriyê û zordestiyê bi hemû reng û şîwazên wan dida diyarkirin, û bi xurtî pişgiriya doza gelên blindest dikir. Li kêleka karê wê yê di warê perwerdekirinê de, Rewşen Bedirxan

أنواع هذه الظاهرة فهي عموماً: الهجرة الداخلية: التي تتمثل في هجرة الإنسان من منطقته إلى منطقة ثانية داخل حدود وطنه الأم. و الهجرة الخارجية: التي تتمثل في هجرة الإنسان من وطنه الأم إلى وطن ثانٍ خارج حدود وطنه. و يعد هذا النوع من الهجرة من أهم الظواهر الاجتماعية في عصرنا الحاضر، و أكثرها انتشاراً بين أوساط الشباب. وهناك أنواع أخرى من الهجرة، كالهجرة القسرية الإجبارية، والهجرة الاختيارية، والهجرة المؤقتة، والهجرة العلمية.

في ظل ظروف الحرب التي تعيشها سوريا، ازدادت - للأسف - الأسباب التي أدت إلى هجرة الشباب، ودفعتهم إلى ترك بلدهم والتوجه نحو بلدان أوروبا الغربية خصوصاً، بحثاً عن حياة أفضل ومستقبل أكثر ضماناً بحسب اعتقادهم، مما جعل المجتمع السوري داخل الوطن، و (روجافا) بشكل خاص يشهد انخفاضاً ملحوظاً في نسبة الشباب.

- أسباب ودوافع الهجرة الشبابية:

وهي بصفة عامة: الحروب، والنزاعات العسكرية، والخوف من الانخراط في المنظومة العسكرية، و الضغوطات السياسيّة، و عدم توفر فرص عمل مناسبة للشباب، وبجشهم عن سبل العيش، و الرغبة في ظروف حياتية تنسجم وتتلاءم مع أفكار الشباب ورغباتهم. ناهيكم عن أسباب أخرى، كالانبهار بالحرّيات والحياة الغربيّة، والزيادة السكانيّة، والضغط النفسي. أما الأسباب الخاصة بالأوضاع في (روجافا)، فلا تتعد كثيرا عن تلك الأطر.

هجرة الشباب في (روجآفا) ..

ما هي أسبابها، و آثارها، و آليات

الحَدِّ مِنْهَا

تقریر: میثان ابراہیم

إنَّ مرحلة الشباب هي المرحلة العمرية الأهم في حياة الإنسان، و التي تتميز بالقوة و الحماسة، و القدرة على الإنتاج و الحركة.. فالشباب هم عماد مستقبل الأمم، وآمالها بالغد المشرق الوضاء. ولعل قضية هجرة الشباب تعدّ من أخطر القضايا وأكثرها حساسية في المجتمعات الإنسانية، وهي ليست ظاهرة طارئة، بل هي ظاهرة قديمة حديثة، رافقت جميع العصور البشرية. فما هي الدوافع الحقيقية وراء تفكير الشباب بالهجرة في (روجافا) ؟ ما دور المؤسسات المجتمعية في مواجهة هذه الظاهرة الخطيرة؟ و تحديدًا دور وسائل الإعلام في توعية الشباب بمخاطرها ؟

- تعريف الهجرة و أنواعها:

تعتبر ظاهرة الهجرة من الظواهر الاجتماعية المنتشرة بين الدول، ومن القضايا الشائكة على المستوى العالمي، وتعرف بأنها عبارة عن انتقال الإنسان من وطنه الأم إلى وطن ثان للعيش فيه، لأسباب متعددة. أما



الانتاج. ناهيكم عن التوعية المستمرة من قبل وسائل الإعلام لتعريف الشباب بمخاطر الهجرة و تداعياتها السلبية. أخيراً نقول: يتمنى الوطن من كافة الشباب المهاجرين، و أصحاب الخبرات والمواهب العودة الى ارض الوطن، لأنه بحاجة الجميع، و هذه العودة أمرٌ ضروري لإعادة إعمارهِ وازدهاره كما يجب أن يكون الإعمار والازدهار. ■

حول هذا الموضوع تحدث الشاب رامان حمو (٢٦ سنة) لـ مجلة ولات و ذكر الأسباب التي دفعته إلى الهجرة و هي : الوضع الأمني القلق، والوضع المعيشي الصعب إلى حد ما، وغلاء الأسعار. كما تعرّض إلى صعوبات الزواج وتكوين أسرة، مما دفعه إلى الهجرة إلى أوروبا، و السعي لتأسيس حياته في مجتمع بعيد - إلى حد كبير - عن مجتمعه، على الرغم من كونه يحمل شهادة جامعية. وذكر وليد عبد الله (٢١ سنة) أنّ من أبرز الأسباب التي تدفع إلى هجرة الشباب السوري، وهو واحد منهم: الصعوبات في إيجاد العمل، و الفوضى الإدارية والمحسوبيات التي تزداد وتيرتها في ظل ظروف الحرب.

- آثار ظاهرة الهجرة:

من الآثار السلبية: انخفاض مستوى الأيدي العاملة، و فقدان الخبرات والمواهب لصالح بلدان أخرى (هجرة العقول) و البعد عن العائلة والأصدقاء، و الإحساس بالغربة. أما الصعوبات التي تواجههم في تلك البلدان، فهي نفسية أو اجتماعية أو اقتصادية، بالإضافة الى عدم شعور الفرد بالاستقرار والاطمئنان، و التخلّي عن بعض القيم و المبادئ للتماشي مع المجتمع الجديد.

أما الآثار الإيجابية، فمنها: رفع مستوى المعيشة والدخل للإنسان ولعائلته. والحصول على مستلزمات الحياة، و التقليل من نسبة الفقر والبطالة، اللذين يؤديان إلى رفع الطبقات الفقيرة، و زيادة النقد الأجنبي للوطن الأم.

- رؤية مستقبلية لمعالجة أسباب هجرة الشباب السوري: عن دور المؤسسات المجتمعية في مواجهة هذه الظاهرة الخطيرة، و تحديداً دور وسائل الإعلام في توعية الشباب بمخاطرها، حدّثنا الأستاذ صلاح الدين حسين، (٤٣) سنة، وهو ناشط في مجال المجتمع المدني، قائلاً: يجب على مؤسساتنا المجتمعية تشجيع الشباب على المشاركة في الحياة السياسية و الاجتماعية، وتحفيزهم على عدم التخلي عن أوطانهم، و توفير فرص عمل للخريجين والقادرين على العمل، وفتح أماكن استثمارية لاستيعاب أعداد كبيرة منهم، و القضاء على المحسوبية والواسطة، و الاهتمام بمؤهلات الشباب، و تحقيق مبدأ المساواة و العدل، و توفير الامتيازات الأساسية لفئة الشباب تحديداً. وكذلك الاهتمام بتوفير الخدمات الصحية و الاجتماعية و الثقافية و الترفيهية، و عدم تركيزها في مناطق محدّدة، واستغلال خامات البيئة في إقامة صناعات محلية صغيرة. إضافة إلى تحسين ظروف الحياة الريفية، و تحسين أسلوب العمل الزراعي بإتباع الطرق العلمية لزيادة



guhdan bi çaksaziya civakî jî fikir, lêkolîn li ser rewşa girtiyên zindanan bi taybet yên jin çêdikir, û dixwest ku rewşa jinên belengaz baş bike, herwiha ji bo karê xêrxwaziyê destê wê herdem dirêj bû, bêguman sinc û nîrxên wê yên payebilind û mîran bû, çiku ew bi xwe ji malabata mîran e.

Rewşen Bedirxan du caran zewicî, cara yekem du salan dirêjkir, lê cara duyem bi mîrê payebilind, rewşenbîr û zimanzanê mezin, ronakbîrê kurd yê gewre mîr Celadet Bedirxan re bû ku di 2-2-1935an de pêre zewicî.

Rewşen Bedirxan ji bo hevserê xwe Celadet piştgir, alîkar û danpêdaner bû, di xweşî û nexweşiyê de li kêleka wî bû, barê jiyana giran mil bi mil pêre radihişt, kêf û şahî, xem û azarî pêre parvedikir.

Rewşen weke nivîskareke jin di nav kurdan de pênuşeke pêşeng e, gelek gotar bi zimanên Erebî, kurdî û tirkî nivîsîn û belav kirin, herwiha bi zimanê ferensî û inglîzî jî dizanîbû.

Di sala 1956an de bi hevkarîya

D.Nûrî Dêrsimî, Hesen Hişyar, Heyder Heyder û Osman Efendî "komeleya çand û hevkarî ya kurdî" damezirand.

Di sala 1957an de nûnertiya kurdan li kongrê Etînayê yê li dijî dagîrkeriyê kir, tevî ku şofîzmên ereb wekî "Mîşêl Eflaq" ku ew jî li kongirê amadebûn û gelek fişar li Rewşen kirin da ku nehêlin gotina xwe bixwîne, û tevî gellek astengiyên ku li ber datanîn lê ewê bi vîneke polatî li hemberî wan rawestiya û gotara xwe ya bi navê kurdan li kongrê xwend, ew gotara ku dengvedaneke xwe ya pir mezin û erênî di nav kesên amadebûyî de çêkir.

Navê Rewşen Bedirxan di pirtûka "nivîskarên jin yên sûrî 1892-1987" de hatiye nivîsîn û weke nivîskareke sûrî pêşeng û berz hatiye danasîn, û rûpelek temam ji bo jiyana wê û berhemên wê di wê pirtûkê de hatiye tîrxandin.

Rewşen, li ser gelê xwe yê kurd û êş û azarên wî hin pirtûk, lêkolîn û gotar bi zimanê erebî danîne, di sala 1972an de beşdar bû di amadekirina kongrê 3mîn yê "yekîtiya jinên kurd" de yê ku li başûrî kurdistanê li dar ket, û rolek berz di serkeftina kongir de lîst.

Piştî koçabarkirina hevserê wê Celadet di 15 tîrmeha 1951an de gelek zehmetî di jiyana xwe de kişand, lê em dikarin bibêjin ku ew nemûneya jina tekoşer û xebatkar e, ticaran bêhêvî nasnedikir.

Di sala 1972an de ji şamê berê xwe da bajarê Banyasê, bi hêviya ku rewşa jiyana xwe baş bike, û heya roja xwe ya dawî li wir jiya. Mîra kurd Rewşen Bedirxan di 1-6-1992an de koça dawî kir, lê ew bi nav û deng û karê xwe di nav gelê xwe de zindî ma. ■

Jêder :

Rewşen Bedirxan..jiyan û karên wê ...(Dilawerê Zengî)

تولستوي وفن كتابة الحياة



فراس محمد

(إنني أخاف موت تولستوي، فموته يحدث فراغاً كبيراً في حياتي، ومن شأن الأدب الروسي أن يتحوّل - بفقدته - إلى قطع من دون راع).
تشيخوف

كتب تولستوي أثناء عمله في رواية: «الحرب والسلام» أنه يرى المهمة الأساسية للإبداع الفني في أن «يُجبر على صبر الحياة، في جميع ظواهرها المتعددة، التي لا تنضب». إن تولستوي يعرض علينا الحياة في مؤلفاته، بتلك الغزارة المتعددة الجوانب، حتى أن غوركي يملك الحق الكامل في أن يقول: «إن تولستوي عالم كامل». لقد أكد تولستوي أن الفن ضروري للحياة، لأنه «يكشف للناس عن أشياء جديدة»، ويُعلم الناس أن يروا، ويفهموا، ويشعروا.. وتكمن الميزة الرئيسية للفن الحقيقي - برأي تولستوي - في القدرة على عدو القارئ والمستمع والمُشاهد بتلك المشاعر التي عاشها الفنان نفسه. قال تولستوي: «إن على الإنسان البارد، واللامبالي، والجاهل، وذلك الذي لم يعان من أي شيء، ألا يعمل في الفن أبداً». وبرأيه أن «التأج الفني الأصيل - المعدي - لا ينتج إلا عندما يبحث الفنان»، ويجب على «النتاج أن يكون بحثاً» هذا ما كتبه تولستوي في يومياته.

وقد نظر تولستوي إلى العمل الأدبي، كما يُنظر إلى العمل الذي «يُهيئ للعيش على أساس تلك الكلمات التي يقولها»، وقال لأخوته في الكلمة: «لا يجب الكتابة إلا عندما تكون قادراً أن تُخلّف في المحبرة قطعة من لحمك في كل مرة تغمس فيها ريشتك». وسمّى تولستوي اهتمامه ولهفته للأحداث، والناس الذين يكتب عنهم، وكذلك اعتقاده في صحة أفكاره التي يدافع عنها بعصب الفن. وكان يعشق بكل قوى روحه «مادة عمله». وبرأي تولستوي: «على الفنان ألا يدّخر جهداً في سبيل تجسيد أي مضمون في الشكل الأفضل». ويؤكد تولستوي أنه لا وجود لعمل فني حقيقي بدون فكرة ملهمة، صادقة، عميقة: «إنها خطيئة مرعبة أن نعتقد إن الرائع يمكن أن يكون بلا معنى». كان كل عمله موجهاً ضدّ هذه «الخطيئة المرعبة». وكان تورغينيف على حق عندما دعا تولستوي بفنان الفكرة. وبعد تولستوي من أولئك الفنانين الذي يُعبّرون بدقّة عن علاقاتهم مع ما يصورونه، ولهذا السبب يدوي صوت المؤلف في أعماله بهذه القوة، إذ لا يمكن أن يكون الفنان مراقباً،

لا مبالياً نحو الأحداث التي يصوّرها. فالفنان يعجب، يشغف، يفصح، يفرح ويحزن، ويجبر القارئ بكل قواه أن يعيش من جديد كل اختلاجات الحشاء التي تسيطر على البطل.

إنّ الصور الفنية التي يقدّمها لنا تولستوي، تدهشنا بحيويتها، وينصح غوركي جميع الكتاب أن يتعلموا من تولستوي «مرونة النقش المدهش للأشياء». ويضيف غوركي: «عندما تقرأه - أنا لا أبالغ، وأتحدّث عن انطباعي الشخصي - يتكون لديك انطباع عن الواقع، والتكوّن الفيزيولوجي لأبطاله، حتى تكاد تظن أنهم يقفون أمامك، ويريدون لمسك بأصابعهم؛ لهذه الدرجة، وتلك المهارة نُقشت لوحاته الفنية». لقد أعطى تولستوي ما لم يعطه كاتب آخر من قبله، من الصور الفنية المرسومة والمتحركة والمتطورة للأحداث، والشخصيات الإنسانية الحية المعقدة والمتناقضة، ويتميز أسلوب تولستوي عن غيره، بأنه لا يقدم وصفات تامة، نخائية لوجه الشخصيات، فيترك المجال لكي تتفتح لنا شخصية البطل، ووجهه الخارجي، وطبائعه مع الحركة المستمرة، فهو تدريجياً يكلم القارئ، كيف يتصرف البطل، وبماذا يفكر ويتحدّث، وأي انطباع يحدثه عن الآخرين... إن تولستوي عالم نفسي كبير، ألع بوصف طريق التطور للحياة الروحية لأبطاله، وفي الكشف عن «ديالكتيكية الروح». يقول تولستوي: «إن الهدف الرئيسي للفن هو أن يقول، وأن يُظهر الحقيقة عن روح الإنسان، وأن يكشف عن تلك الأسرار التي لا يمكن التعبير عنها بكلمات بسيطة.. الفن عبارة عن ميكروسكوب، يسلطه الفنان على روحه، ويعرض تلك الأسرار المشتركة مع الناس». لقد امتلك تولستوي بشكل مدهش فن الصفة للتحليل النفسي الدقيق، والقدرة على نزع الغطاء من أكثر الحركات سرية للقلب البشري. لقد استخدم فنه الفائق «علم الإنسان» من أجل هدف واحد: «أن يقول الحقيقة للناس، عن الحياة وعن أنفسهم».

ويرى تولستوي بوضوح أن طبيعة الصفة الفنية والدرجات متفاوتة في استقامة وصحة الصورة تتعلق ب: لمن يتوجه العمل الفني والأدبي، فعندما يتوجه الأديب والفنان إلى النخبة، أو القلة من «المقيمين» الذين يطالبون بالشكل الرقيق، المهف، يختلف كلياً عن الأديب الذي يتوجه إلى الملايين من الناس الذين يكونون «العالم الكبير الحقيقي» حسب تعبير تولستوي المحب إليه، ويقدم البساطة والإيجاز والوضوح في نوعية المقاييس للأشكال الفنية المتكاملة. وأشار تولستوي إلى أن مثل هذه الأعمال المستجيبة لتلك المطالب عملٌ شاق ولا يستطيع فعل ذلك إلا فنّان علمي.

وكتب غوركي، مُعبراً عن إعجابه بالموهبة الهائلة، وعن غنى شخصية تولستوي: «فيه شيء ما، يوقظ بداخلي الرغبة المستمرة، أن أصرخ بكلّ إنسان، بالجميع: أنظروا، أيّ إنسانٍ فريد يعيش على هذه الأرض... وتنبأ لينين بأنّ مؤلفات تولستوي «ستظل تُقدّر، وتُقرأ من قبل الجماهير، عندما يهيؤون لأنفسهم الظروف الإنسانية للحياة، وبعد أن يزيلوا اضطهاد الملاكين والرأسماليين..»

لقد كتب تولستوي في يومياته ربيع ١٠٩١ وكأنه يتأمل الدرب الطويل الذي اجتازه، ويُفكّر بأهم شيء كان في أيامه وأعماله، فقال: «إنّ الأوقات السعيدة في حياتي، هي تلك الأوقات التي منحنيها كاملة لخدمة الناس». وهكذا فإن الزمن غير قادر على محو أهمية الأعمال الفنية لهذا الإنسان الفريد، تلك الأعمال التي دخلت والى الأبد في الحياة الروحية للبشرية جمعاء. ■

الفوقية بحسب ماركس و أنجلز، ذلك أنّ بعض القرى ستتسع لغير سبب، فتتحوّل إلى مدن، كان تتمتع بعضها بأهمية تجارية لأنّها شكّلت عقدة مواصلات - تدمر، مثلاً - أو أن تتوضّع بعضها الآخر على السواحل فتشكّل موانئ للتصدير والاستيراد كجبيل، على هذا كانت ممالك المدن أول أنماط الدولة كما في حالة أور أو أوروك السومريتين، ثمّ توسّعت ممالك المدن - تلك - فشملت مناطق واسعة - لها طابع الامبراطوريات - كالدولة الأكادية أو الدولة الآشورية أو الدولة المقدونية!

لقد أنتج الإنسان الثقافة بوساطة اللغة، لتتحوّل اللغة - من ثمّ - إلى وعاء لها، هكذا ظهرت - فيما بعد - الآداب والفنون، ثمّ حاول أن يفسّر الحياة والكون، أو يحدّد علاقته بهما، فتخلقت الفلسفة والدين، ناهيك عن أنّه حاول أن يطوّر هيمنته على موارد الطبيعة فأنّج العلوم، وفي وقت متأخر سينتج الصناعات، على هذا يمكننا الجزم بأنّ الثقافة نظرية في السلوك، في حين إنّ العلم عبارة عن نظرية في المعرفة!

ربّ تساؤل منطقي يُطرح بالاستناد إلى التطوّر الذي ساس حياة البشر مفاده: أليس حرياً ببشر راحوا يصعدون مدارج التطوّر أن يحفظوا سلمهم الأهليّ على نحو يضمن حيواتهم؟!

وفي الجواب سنفاجيء عدداً غير قليل من القراء بأنّ الإنسان إذا كان قد سجل تطوُّراً مذهلاً في الاقتصاد، وإذا كان - بالتوازي مع تلك الطفرة الاقتصادية - قد أنتج اللغة، ثمّ أنتجت اللغة ثقافته، ناهيك عن أنماط التجمع الدولي التي أنتجها، إلّا أنّ تطوُّره في المجال الحقوقي كان بطيئاً جداً، إذ إنّ أنماط الحكم الحديثة - الجمهوريّة، مثلاً - أو صيغة العقد الاجتماعيّ إنّما تعود لبضع مئات من السنين فحسب، على نحو يخلّ بمفهوم النسق الذي أتينا عليه، لقد نمت تلك الأنماط وترعرت في ظلّ فلسفة الأنوار، أي في ظلّ النهضة الأوروبيّة، لتجد أول تطبيق لها في الثورة الفرنسية ٩٨٧١ - ١٩٧١، وليطرح روسو - من ثمّ - عقده الاجتماعي، في محاولة لترسّم العلاقة بين الحاكم والحكوم أو رسمها على أسس مغايرة لأنماط الحكم القديمة، بل أنّ شرعة حقوق الإنسان والهيئات الدولية - التي أنيط بها الحفاظ على حقوق الأفراد والجماعات، وتنظيم العلاقات بين الأمم - لن تظهر إلّا في القرن المتصرّم، على هذا سنذهب إلى أنّ العلاقات بين الدول احتكمت إلى المصلحة، أي إلى برغماتيّة «جون ديوي» عارية وصفيقة، ولعلنا في هذا الإطار نستشهد بصامويل هنتغتون في كتابه الدائع الصبوت «صراع الحضارات»، أو نصادق على رأينا السابق بإعلان فرنسيس فوكوياما لنهاية التاريخ، غبّ أن لحسم الصراع بين المعسكر الغربيّ ومنظومة الدول الاشتراكيّة لمصلحة الأول، فتركت دول أوروبا الشرقية لمصيرها، بعيداً عن هيمنة السوفييت، ثمّ تفكّك الاتحاد السوفييتي ذاته، ليتبيّد - من ثمّ - قطب واحد مُمثلاً بالولايات المتحدة، التي تحصّلت على قوة غير مسبوقة!

وبالعودة إلى السياقات التي أتينا عليها - في اجتماعها - سنشير إلى أنّ أيّ انتعاش اقتصادي يستدعي تحركاً من الجماعات في الجوار للعمل على استثماره، هل نستشهد بدول الخليج بعد الطفرة النفطية

مثلاً؟! ثمّ أليس هذا ما حدث في سيبيريا الباردة بعد ظهور كميات كبيرة من الغاز الطبيعيّ فيها؟! بل أليس هذا ما قام به المغامرون الأوروبيون في الغرب الأمريكيّ غبّ اكتشاف القارة، حتى إذا نضب الذهب تحوّلت مدنه إلى أمكنة تؤقّها الأشباح لحين؟!

بالأتكاء على ما أسلفناه - إذاً - تحركت الأقوام المقيمة على طريقي الحرير، لتتنعم بثماره، فهل ثمة حاجة إلى أنّ نذكّر بأنّ الطريق يمرّ بسوريا، أو أن نشير إلى أنّ الملل اجتمعت على طرفيه، وذلك لتقوم على خدمته من جهة، ولتتنعم بالمجتي الناجم عن مروره بهم من جهة أخرى؟ لكنّ الهويّات المنجزة فيها، واحتكام تلك الهويّات إلى الصراع على طريق التجارة ذاك - بهدف الاستحواذ عليه - كان عبئاً على سلم أهلها، صحيح أنّه لم يطح بهذا السلم تماماً، لكنّه عرّض حالة التعايش للخطر غير مرّة بحدود، وفي هذا يمكننا أن نوّكد على كلامنا، فنستشهد بمعركة قادش، ذلك أنّ الحثّيين كانوا متوضعين على جنوبي آسيا الصغرى - تركيا اليوم - فيما كان الفراعنة يحكمون وادي النيل - مصر اليوم - بيد أنّ العلاقة بينهما ساسها خلاف دائم بسبب الصراع على سوريا، فخاض الطرفان معارك طاحنة في هذا السياق، لعل معركة قادش - جنوبي حمص - أبرزها، إذ إنّها أسفرت عن اقتسام البلد بينهما، فاستأثر المصريون القدامى بجنوبي بلاد الشام، فيما تحصّلت الحثّيون على شمالي سوريا! ■

يتبع في العدد القادم

Romannivîs

HELÎM YÛSIV

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtan

Kovara Welat

Nêzikî sîh salan e ku di qada wêjeyê de berhemine bilind û hêja pêşkêş dike. Bi helwesteke modern, bi honaksazîyeke spehî û bi zimanekî petî û nerm berhemên xwe dinivîse. Romannivîs Helîm Yûsiv, helbest ne tê de, pirê celebên wêjeyî dinivîse û di rojname, kovar û malperên kurdî de, bi gotar û nivîsaran, nirxandinên xwe diweşîne.

Ji bo nirxandin û şîrovekirina hin mijaran, kovara Welat hevpeyvînek bi nivîskar Helîm Yûsiv re kir. Beşa pêşîn a hevpeyvînê di barê nirxandina berhemên Helîm Yûsiv de ye. Di beşa duyan de, Yûsiv şîrove û nihêrînên xwe li ser wêjeya kurdî bi giştî û ya Rojavayê Kurdistanê bi taybetî, vedibêje. Herî dawî jî, mijara ragihandina kurdî û têkilîya wê bi wêjeyê re tê nîqaşkirin.

Helîm Yûsiv sala 1967an li devera Amûdê ya Rojavayê Kurdistanê ji dêya xwe bûye. Li Zanîngeha Helebê Fakulteya Mafnasîyê qedandîye. Ji destpêka salên 90î ve dinivîse û heta niha berhemên wî ji bo gelek zimanan hatine wergerandin. Ji sala 2000î ve çûye Almanayê û hêj li wî welatî dijî.

Berhemên wî:

- Mêrê Avis (çîrok, 1991)
- Jinên Qatên Bilind (çîrok, 1995)
- Mirî Ranazin (çîrok, 1996)
- Sobarto (roman, 1999)
- Memê BêZîn (çîrok, 2003)
- Tirsê Bêdiran (roman, 2006)
- Gava ku Masî Tî Dibin (roman, 2008)
- Romana Kurdî (lêkolîn, 2011)
- Auslander Beg (çîrok, 2011)
- 99 Morîkên Belavbûyî (roman, 2015)
- Wehşê di Hundirê Min de (roman, 2018)

- Nivîskarîya te, encam û berhema destpêkeke çawa ye?

Ez jî baş nizanim çawa nivîskarîyê jîyana min bi temamî mîna qederekê bi xwe ve girê da. Meseleyê pir zû û bê plankirin dest pê kir. Xirecir û aloziyên vê axa ku ez

“Pêdivîya hemû wêjekarên Rojavayê Kurdistanê bi wê yekê heye ku li xwe vegerin, kumên xwe deynin ber xwe û bifikirin.”



li ser ji dayik bûme, zaroktiya min dor pêç kiribû û roj bi roj ben li qirika min teng dikir û bêhn li min diçikand. Yan divabû mirov bédeng mirar here û xwe bisipêre jîyaneke bêwate; yan jî divabû mirov li çareyekê bigere û rihê xwe ji nav pencên mirinê rizgar bike. Ji bo min, nivîsandin ew oksîjen bû ya ku ji bo berdewamkirina jîyanê pêdivîya min pê hebû. Bi gotineke din, nivîsandin alternatîva bitenê ya mirinê bû.

- Babet û naveroka berhemên te, ji kû tên û çawa peyda dibin?

Sê jêderên sereke yên babetên berhemên min hene; yek jê jîyana min a takekesane û serborîyên min in, ya din cîhana xewn û xeyal û fantaziyên min in û ya dîtir jî paşxaneya min a ku ji xwendina wêjeya nivîskî û ji guhdarîkirina wêjeya devkî dagirtî ye. Ev hemû bi hev re naveroka berhemên min bi gewde dikin. Wisa jî çî li jîyanê hebe dikare ji berhemên min re bibe babet, tu sînôr ji vê çavkanîyê re tune ne.

- Rengê derûnî di berhemên te de serdest e. Serdestîyeke wisa, bi zanebûn e yan jixweber e?

Bizava nivîsandinê bi xwe, li cem min, ji mejî û plankirinê bêhtir bi hestan ve girêdayî ye. Di kêlikên nivîsandinê de ez rê li ber kanîya binhiş û kûrahîya giyan û bîrmendîya xwe vedikim. Bi mijarên xwe re heta dawî dilsoz im û agirekî ku serê tilîyên min neşewitîne, ez nikarim li ser binivîsim. Nivîsandin dengê wan hestên kûr e, ewên ku di nav tarîya hiş û giyanê mirov de veşartî ye. Dibe sedema ku di hêla rengê derûnî li pêş be ev be.

- Her çî qas babetên romanên te ji hev cuda bin jî, lê dîsa -heta astekê- xwî û bawerîne wekhev, lehengên te digihînin hev. Kesayeta Helîm Yûsiv, çî qasî desttêwerdanê di tevgerandina lehengan de dike?

Carinan kê, carinan zêde, tiştêkî min di hemû kesên sereke yên

çîrok û romanên min de heye; ez beşek ji wan im û ew beşek ji giyanê min in. Bi xemgînîya wan xemgîn dibim û bi kêfxweşîya wan dilê min şa dibe. Têkilîyeke giyanî di nav min û wan de heye. Lê ev rê li ber wê yekê nagire ku ew ew in û ez ez im. Di her deqekî wêjeyî de mentiqek heye, tevineke hunerî heye, ji bo ew mentiq neyê şikenandin û ew tevin bi rêk û pêk bê honandin, ez ne ji dûr ne ji nêzik desttêwerdana jîyana wan û rabûn û rûniştina wan nakim. Hinek ji wan hene ku ez ji xisletên wan ên xerab û bêhişîya wan pir zivêr û aciz im. Hinek jî hene ez ji taybetmendiyên wan hez dikim. Lê ji her du cureyan jî, weku nivîskar, ez bi mesafet im; navbereke berbiçav û pêwîst di navbera me de heye. Heta ji min tê ez karakter û kesên berhemên xwe serbest û azad dihêlim. Ew li gor xwe û li gor pêdivîya rola xwe û ne li gor daxwaza min di berhemên min de tevdişerîn.

- Di roja îroj de, tu xerîkî çî xebatê yî, çî di nav destên te de heye?

Ji dema şerê Kobanê, ji 2014an ve, romanek li ser wî şerî di nav destên min de ye. Min bi alîkarîya hin kesên ku li Kobanê diman dest bi wê romanê kiribû. Gava DAÎŞ kete Kobanê, di wê tevkujîya xedar de hin ji wan kesan bi xwe şehîd ketin. Ez neçar mam ku rawestim. Berî salekê careke din li wê romana xwe ya nîvcomayî vegerîyam û ew şehîd bi xwe bûn vebêjerên romanê. Min nivîsandina wê qedand û niha tê sererastkirin. Wê di sala pêşîya me de bê weşandin.

- “Çûna ber bi romanê ve ji bo min destpêkê wekî çûna bajêr bû.” Di nirxandina xwe de, te çîroknivîs bi gundiyan nimandine û romannivîs jî bi bajarîyan. Di qada wêjeyê de, nîrxê romanê ji yê çîrokê bilindtir e?

Ez bawer dikim hinekî jihevîfêmnekirin heye. Bajarîbûn û gundiya bûna ez li vê derê behsa wan dikim girêdayî mezinbûn û biçûkbûnê ye û tu têkilîya wê bi nîrxên bajarvanîyê û gundiya ve tune ye. Ji hêla nîrxên wêjeyî û hunerî ve tu cudayî di navbera romanê û çîrokê de nîne. Wêje nîrxên xwe ji asta xwe ya hunerî digire, ne ji celebên xwe. Roman be, çîrok be, dikare wêjeyeke nîrxbilind be, dibe jî bîrnîrx û bêast be.

- Zimannas Bahoz Baran dibêje: “WEHŞÊ

DI HUNDIRÊ MIN DE, 99 MORÎKÊN BELAVBÛYÎ, AUSLANDER BEG, ji gelek alîyan ve û bi taybetî ji aliyê zimanî ve pirtûkên qels in...” Ji bo rexneya Baranî, tu çî dibêjî?

Ez tu qîmetê nadim “rexneyên” weha; ji ber ku ji rexneyê bêhtir nêzikî dijûnan û biçûkxistinê ye.

Ez dixwazim li vir behsa hin xalên girêdayî vê mijarê bikim. Heta berî demekê, li Bakur dîyardeyeke weha hebû, hema kesekî pirtûkeke nû bi dest xwe ve digirt, dest bi zimên dikir. Ev hevok weha, ev peyv weha û dihat jibîrkirin ku ev pirtûk romaneke çawa ye yan çîrokeke çawa ye û her wisa her kesî şûrê standarta xwe li wê berhemê dikişand û dida ber derbê xedar. Ew dîyarde çû, dîyardeya zimanzan û zimannasan hat. Her demekê kesek derdikeve û xwe weku zimannas nîşan dide. Standarta wî devoka gundê wî ye û di nav gund de jî devoka pîrka wî ye û dest pê dike her kesî û her berhemê li serrada pîrka xwe dixîne û li gor wê, li cem wî, berhem an qels an jî xurt derdikeve. Niha ev dîyarde jî hêdî hêdî ber bi nemanê ve diçe. Bê guman, ev hemû encamên tunebûna standarteke yekgirtî ji bo kurmançîya nivîskî ne.

Ji bo min, ji ber ku li Bakur pirtûkên min tên weşandin, heta ji min tê ez bi kurmançîyeke nêzikî vê standarta ku hêdî hêdî jixwebere ji bo kurmançîya nivîskî çêdibe, dinivîsim. Wisa jî carekê û carinan zêdeyî carekê, berhemên min ji hêla weşanxaneyê ve tene sererastkirin.

Îcar, eger ku nêta wî ji van gotinan baş be, bila birêz Bahoz Baran kerem bike wê qelsîyê destnîşan bike, da ku em di çapên bê de, van berhemên wê qelsî biweşînin.

- Di kurmançiyê de hêmana ku hema hema peyda nabe, ya ku nayê pejirandin, a ku dilmayîn û dubendîyê bi xwe re tîne: Rexne ye. Vekirina evê girêkê, çawa dikare pêk were?

Di bawerîya min de pîrsgirêk ne di rexneyê de ye -wekî ku te di pîrsa xwe de gotîye-, lê di tunebûna rexneyê de ye. Bi giştî, tiştê ku heye ev e; hin nîrxandinên ku xwe disipêrin pîvanên ne wêjeyî û ne jî rexneyî. Bala xwe bidê, dema berhemeke nû derdikeve, hema hema hemû nîrxandinên nivîskî û yên devkî jî xwe disipêrin pîvanên sîyasî yan jî civakî ku girêdayî têkilîyên takekesane ne. Ev pîvan di navbera du rengan tenê de diçin û tên, yan reş e yan jî sipî ye û di navbera her du rengan de nîrxandin an pîr kê an jî tune ne. Ev perçebûna di navbera du rengan de, di van salên dawîyê de, di civaka me de li Rojava bi dubendîya sîyasî re kûrtir û xerabtir bû.

- Li Rojavayê Kurdistanê, dîyardeyeke tirsnaq û birîsk xwe dide pêş; ne tenê peyrewên partî û

